

Vaksena/derziya KOVÎD-19ê

Vaksen çi ye?

Vaksen cureyek derman e. Ew ji derziyê derdikeve.

Vaksen çi dike?

Lêdana vaksenê we ji nexweşiyê diparêze. Bo nexweşyên cur bi cur vaksenên cur bi cur hene.

Gelo vaksen ewle ne?

Erê. Bijîşk û zanyar gelekî kar dikin bizanin vaksen ewle ne. Tenê vaksenên ku wekî ewle erê bûne li Kanadayê bi kar tên. Ewlebûna vaksenan car bi car tê venêrîn.

Gelo bo KOVÎD-19ê vaksen heye?

Erê, bo KOVÎD-19ê çend vaksen hene.

Gelo vaksenên KOVÎD-19ê ewle ne? Ew gelekî zû hatin çêkirin.

Erê. Bijîşk û zanyaran gelekî kar kirin piştrast bin vaksenên KOVÎD-19ê ewle ne. Tenê vaksenên ku wekî ewle erê bûne li Kanadayê bi kar tên. Ewlebûna vaksenan car bi car tê venêrîn.

Gelo dikarin ji vaksenê KOVÎD-19ê bigirin?

Na. Hûn nikarin ji vaksenê KOVÎD-19ê bigirin. Vaksen arîkar e bedena we KOVÎD-19ê nas û pê re şer bike.

Gelo nîşaneyên kêlekê vaksena KOVÎD-19ê hene?

Piştî lêdana vaksenê, renga nîşaneyên wê yê kêlekê hebin. Renge piştî lêdana derziê milê we biêşe. Renge hûn xwe estî hîs bikin yan taya we hebe. Ev yanê bedena we bersivê dide vaksenê. Ev bandorên kêlekê dikarin çend rojan dirêj bibin. Renge hin kes alerjiya wan bo vaksenê hebe. Renge nîşaneyên wan ên kêlekê cidîtir bin. Ev nîşaneyên kêlekê yê cidîtir pirr kêmin.

Eger nîşaneyên min ji çend rojan pirtir dirêj bin çi bikim?

Beriya vaksenê we vayrus girtiye. Eger nîşaneyên we ji rojekê yan çend rojan pirtir dirêj be, renga hûn nexweş ketibin. Hûn divê xwe cuda bikin *ji kesên din dûr bin) û testa KOVÎD-19ê bidin.

Kî dê beriya her kesî vaksenê lêde?

Bijîşk, perestar û pêkhînerên din ên muqatebûna tenduristiyê li Manitoba'yê vaksen dibin.

Hin kesên ku beriya yê din vaksen dibin ew in ku gelekî nexweş in. Ev bo kesên salmezî û xwecihî ye.

Kingê dikarin vaksen bim?

Bo hemû vaksen bibin wext dixwaze. Kesên cuda li demên cuda vaksen dibin. Dewlet û pispor bi hev re kar dikin wan biryaran bidin. Wexta dema lêdana vaksenê bo gel were, zanyariyên pirtir yê bidin.

Eger ez vaksenê lêdin gelo divê devpêçê lêdim û ji kesên din dûr bim?

Erê. Lêdana devpêçê û dûrbûna fizîkî dê arîkar be hûn û kesên din ewle bimîn.

Gelo divê diravê vaksenê bidim?

Vaksen bo hemûyan li Manitoba'yê belaş e.

Gelo divê vaksenê lêdim?

Eger hûn dixwazin vaksena KOVÎD-19ê lêdin, dikarin hilbijêrin. Hûn neçar nînin vaksenê lêdin.

Gelek kes tiştên cur bi cur ser vaksenan dibêjin. Renge hin zanyarî rast nebin. Bo zanyariyên pirtir ser vaksenê dikarin bi pêkhînerên muqatebûna tenduristiyê re bi axivin. Ew dê zanyariyên baş bidin we.

Herwiha dikarin serdana manitoba.ca/COVID19/vaccine bo zanyariyên pirtir.

Manitoba 